Bidestveanîna Mafên Netewî Yên Gelê Kurd Di Çarçoveya Îranek Demokratîk û Federalî de

Hejmar: 146
06'ê Çiriya Paşîn a 2010
Buha: 150 Tûmen

agiri

Duheftînameyek siyasî, civakî, çandî û hunerî ya
Ku Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê diweşîne

## Peyama Serxweşiya Sekreterê PDKÎ Bi Hinceta Koça Dawî a Dehamê Mîro, Sekreterê Berê yê PDK Sûriyê (Elpartî)

R.2

# Subsîd Bi Çek Û Çekmeyan Ji Holê Radibin



Komara Îslamî a Îranê ji bo birêvebirina yasaya "mebestdarkirina sobsîdan", jordeçûna ji bazariyan di xwe û bi mebesta tepeserkirina her cure nerazîbûnekê li himber radebider a zêdebûna nirxa kel û pelan, hêzên xwe ên çekdar amade kirine. Cihgirê Wezîrê Bazirganî yê Komara Îslamî, roja sêşemî, 11ê Xezelwerê ragihand ku emê 22 kalayên bingehîn ên madeyên xurekî kom bikin heya ku her dema di pêvajoya yasaya "mebestdarkirina sobsîdan" de pirsgirêkek derkeve pêşberî bazarê, di nav xelkê de bihê pervekirin. R.2

## Giran Bûna Binzînê Xwendekarek Neçar Kir Bo Çûna Bo Zankoyê Bi Ker Hatû Çûnê Bike

R.2



## Sarkozî: Ger Mûyek Ji Serê Sekînê Kêm Be, Ezê Têkiliyên Bi Îranê Re Bîdim Qutkirin

R.7



Rûpel 4



Fatih Salihî
Besîc dareke bê...

Rûpel 5




Kampa leşkerî
Ebdulla Hicab

Rûpel 7



Avabûna yekem qutabxaneya kurdî
Baram

Rûpel 9



BÊNAVÎ
Adar Jiyan

www.arsivakurdi.org

# Peyama Serxweşiya Sekreterê PDKÎ Bi Hinceta Koça Dawî a Dehamê Mîro, Sekreterê Berê yê Partiya Demokrat A Kurd Li Sûriyê (Elpartî)



Birêz Lêjneya Merkezî ya Partiya Demokrat a Kurd li Sûriyê (Elpartî)!

Koça dawiya Dehamê Mîro, sekreterê berê yê Lêjneya Merkezî ya we em xembar kirin. Bi vê hincetê em hevxemiya xwe bi we re radigehînin û behî û serxweşiyê ji we yên rêzdar, endam û alîgirên partiya we û endamên malbata xwedê jêrazî Deham dikin.

Ruha wî şad û rêya xebata wî berdewam be.

**Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê**
**Sekreterê Giştî**
**Mistefa Hicrî**
**4'ê Çiriya Paşîn a 2010' a Zayînî**
**13'ê Xezelwera 1389' a Rojî**

## Doma Nûçeya: Subsîd Bi Çek Û Çekmeyan Ji Holê Radibin



Wezareta kalaya rejîmê rojek pêştir ragihandiye ku 48 demjimêr derfet daye wan berhemînerên ku kalayên xwe giran difiroşin û ger piştî wê yekê nirxan kêm nekin, dê cezayên giran ji wan re bihên dayîn.

Herweha ligor ragihandina polîsê Tehranê li roja 7 ê Xezelwerê ve hêzên taybetî ên çekdarên rejîmê, di 10 deverên bajarê Tehranê de ji bo rûbirûbûn tevî nerazîtiyên ku tên pêşbînîkirin, di encama birêvebirina wê yasayê de, xwe amade kirine.

Di Îranê de, abûrî di asta giştî de bi tewawî qorixkiriyê dewletê ye, ewa jî sedema sereke ya serlêşêwiyan di bazar, tirs û biecîna roj li pey rojê ya xelkê ye bo dabînkirina pêdawîstiyên sereke ên jiyanê.

## Giran Bûna Binzînê Xwendekarek Neçar Kir Bo Çûna Bo Zankoyê Bi Ker Hatû Çûnê Bike



Xwendekarekî zanîngeha Çalûs li Îranê bo nîşandana nerzaîbûna xwe derbarê jordeçûna nirxa bnenzînê, ji malê heta zankoyê siwarê kerê bû. Eva jî li halekê de ye ku Serokê Komara Îslamiya Îranê Mehmûd Ehmedînejad ku biryarnameyên Şêwra Ewlekariyê li dijî Îranê wek "kaxezên diryayî" binav kiribû, soza dabû Lubnanê, benzînê wan re bişîne.

Ragihandinên Îranê eşkere kirin ew karê xwendwekarê Îranî, gişt hevalên wî eciband, lê wî ragihand ji ber zêdebûna nirxa hatinûçûnê nikare siwarê taksiyê be. Sedem jî kêmbûna benzînê ye.

Ev xwendekar, kerê xwe rûbirûyê derê zanîngehê sekinand, parêzerê zanîngehê bi tundî li dijî vî sekinî û rê neda bê nava zankoyê, dema pirs jê kirin çima tu bi ker hatî? Got: "Ji durpêçan bipirsin, pêşeroj ji niha xirabtir dibe."

Ji aliyek din ve berpirsên payebilind ên Îranê, nemaze rêberê Komara Îslamî ya Îranê Elî Xamineyî, hê li ser bêbandorbûna durpêçên ser Îranê tekez dikin. Lê çawdêrên pirsên Îranê berewajiyê berpirsên vî welatî difikirin û bawer dikin durpêçên navnetewî dê rewşa jiyana xelkê metirsîdartir bik.

## Civîna "Rewşa îroyîn a girûpên netewî ên ne fars li Îranê, çi ronahiyek bo çareseriyê" di Parlementoya Ewropayê de hat lidarxistin

Roja 26ê Çiriya Pêşîn a 2010 an," şanda parlementoya Ewropayê ji bo peywendî tevî Îranê", tevî "Komîsyona kar û barên derve ên parlementoya Ewropayê", civînek bi navê "Rewşa îroyîn a girûpên netewî ên ne fars li Îranê, çi ronahiyek bo çareseriyê", li Parlementoya Ewropayê li bajarê Brokselê de birêve çû.

Bo baskirin li ser vê mijarê, şandek ji Kongireya Netewên Îrana Federalê bo vê civînê hatibû gazîkirin ku şanda han pêk hatibû ji:

Sidîqe Edaletî gotarek bi navê "bi fermî nasîn û yasayîkirina helawîstina lidijî netewên ne fars di Komara Îslamî de bi sedema qanûna bingehîn" pêşkeş kir.

Nasir Buladeyî ku li ser rewşa îroyîn a netewên zulumlêkirî ên Îranê axivî.

Mîro Eliyar basek li ser avakirina Kongireya Netewên Îrana Federal û siyaset û armancên wê pêşkeş kir.

Di destpêka vê civînê de, "Barbara Lochbihler" seroka şanda Parlementoya Ewropayê bo peywendî tevî Îranê, civîn vekir û piştî îşarekirin bi armancên vê civînê û nasandina endamên şanda Kongireya Natewên Îrana Federal, ragihand ku Balyozê Îranê li welatê Beljîkê li pêk anîna vê civînê haydar kiriye û bo beşdarîkirin di vê civînê de jî gazî kiriye, lê Balyozê Îranê ew pêngava parlementoya Ewropayê bi piştgirî û berfirehkirin bi cudayîxwazî navdêr kir û ev gazîkirin jî nepejirandiye.

Tê zanîn civîna han piştî du demjimêran bi dawî hat û hejmareke berbiçav ji parlementar û herwiha nûnerên komîsyon û şêwra Yekîtiya Ewropayê beşdarî vê civînê bibûn.

# Kongreya Asayî A Hak-Parê Ya 4emîn Hat Lidarxistin

Komcivîna 4an ya asayî ya Partiya Maf û Azadiyan-Hak-Par ê hat lidarxistin. Komcivîn, bi axaftina bi kurdî hat vekirin û heta dawiya komcivînê reng û dengê kurdî di giraniyê de bû.

Komcivîna 4' an ya Asayî ku bi beşdariya ji hezarî zêdetir endam û alîgirên Partiya Maf û Azadiyan hat lidarxistin, li salona Mîmar û Endezyaran ya li Enqereyê pêk hat. Di Komcivînê de, dema ji bo şehîdên demokrasî û azadiyê rêz hat girtin, sirûda neteweyî a "Ey Reqîb" hat xwendin.

Piştî ku Komcivîna 4' an ya asayî ya Partiya Maf û Azadiyan bi dawî bû, encamnameyek hat belavkirin. Di encamnameyê de hat diyarkirin ku pêwistî bi makezagoneke nû ku hebûna kurdan misoger bike, li welatê xwe, xwe bi xwe îdare bike û zarokên xwe bi zimanê xwe perwerde bike, heye.

Encamnameya Komcivîna 4' an ya Asayî ya Partiya Maf û Azadiyan weha ye;

"Ev modela netewe-dewletê ya unîter ku ji despêka damezrandina komarê ve, dixwazin li ser vê erdnîgariya pirnetewe pêk bînin, ji ber ku li gor pirrengiya vê civakê nagunce, hertim bûye sedemê şer û pevçûnê.

Kurdan, tu car hewldanên li hember tunekirin û helandina çand, ziman û hebûna xwe qebûl nekirine û li dijî van hewldanan têkoşiyane. Evroj, hebûna kurdan ya li Tirkiyeyê ku hêjmara wan bi qasî 20 milyonî ye û heta niha hatine înkarkirin, tê qebûlkirin.

Êdî civak dixwaze ev statukoya heyî bê guhertin.

Ji encamên referandûmê jî xuya dike ku ligel hemû astengiyan jî, piraniya civaka Tirkiyeyê dixwaze statuko bê guhertin û Tirkiye bê demokratîzekirin. Encamên referandûmê dide nîşandan ku civakê piştgirî daye polîtîkayên guhertinê. Bi vê rewşa heyî, desthilatdarî bûye xwedî avantajek giring. An dê ev avantaj ji bo çareserkirina pirsgirêkên civakê bê bikaranîn, an jî dê bê hebakirin û demokratîkbûna Tirkiyeyê texîrê pêvajoyek din bê kirin.



Pêvajo û encama referandûmê, "amadekirina makezagoneke nû ya sivîl" wek daxwazeke lezgîn ya civakê daye pêşberê hikumetê û mixalefetê. Ev helwesta hikumetê ya texîrkirina vê daxwazê ya heta piştî hilbijartinan û hewldana wê ya bi niqaşên "poşî-turbanê" ji rojevê derxistina vê daxwazê, bi tu şêweyek nayê qebûlkirin. Piştî ku bandora leşkerî jî nemaye, êdî tû hêz nikare pêşî li hikumetê bigire ku daxwazên civakê bi cîh bîne.

Nêzîgahiya hikumetê ya nerênî ya li hember daxwazên kurdan ya perwerdehiya bi zimanê zikmakî û rakirina "dersên olî ya mecbûrî", dide nîşandan ku naxwaze vê atmosfera erênî ku ji vê pêvajoyê peyda bûye, bikar bîne. Herkes li bendê bû ku derbarê çareserkirina pirsgirêka kurd ya neteweyî de pêngavên hevdem bên avêtin û helwesteke wêrek bê nîşandan. Lê, di van demên dawî de em dibînin ku hikumet dixwaze carek din vegere ser xeta kevneşopiya polîtîkayên şîdetê û ev yek jî em xistine nav fikareyê.

Ev 26 salên borî; hem bi kurdan û hem jî bi dewleta Tirk daye nîşandan ku pirsgirêk, bi şer û şîdetê nayên çareserkirin. Encama israrkirina di polîtîkayên şîdetê de, bi herdû gelan jî êş û azarên mezin daye kişandin û roj bi roj wan ji hev dûr xistiye.

Feraseta dewletê ya carek di "dersdayînê" û carek din bikaranîna metodên leşkerî, xeletiyek mezin e. Êdî Gelê Kurd jî û Gelê Tirk jî, ji vê şerê kirêt bêzar bûne, ji mexdûrbûnê û ji êşkişandinê bêzar bûne. Êdî rêyeke nû çareseriyeke hevdem dixwazin. Ev rêya nû, demokrasî, aşîtî û wekhevî ye.

Jinavê rakirina mexdûriyeta Kurdan ku ev sed sal e dom dike, bi makezagoneke nû ku wekheviya kurdan û tirkan biparêze, mumkûn dibe. Pêwistî bi makezagoneke nû ku hebûna Kurdan mîsoger bike, li welatê xwe xwe bi xwe îdare bike û zarokên xwe bi zimanê xwe perwerde bike, heye. Garantiya ji holêrakirina şîdetê jî, tenê ev e.



Di pêvajoyeke ku makezagoneke nû tê niqaşkirin de, belavbûna Kurdan, li ber hekhelwestiya wan astengek micid e. Ji bo ku Kurd karibin bi erênî ji vê pêvajo yê mifahê werbigirin, divê partî û rêxistinên wan di nav hevkariyê de bin û bi hevdû re tevbigerin. Di mijarên wek perwerdehiya bi zimanê zikmakî û cihgirtina daxwazên Kurdan di makezagonê de, berpirsyariyek mezin dikeve ser milê hemû partî, sazî û dezgehên Kurdan ku yekhelwest bin û bi hevdû re tevbigerin. Tu hinceteke mafdar ya xwejêvadana vê yekê tune. Herî kêm pêwistî bi yekîtiya wan aliyên ku di aliyê ramanî de nêzî hev in, heye. Partiya me, di vî warî de amade ye, wezîfeyê ku bikeve ser milê wê, bi cîh bîne.

Partiya Maf û Azadiyan, ji Komara Tirkiyeyê daxwaz dike û pişgirî dide pê ku bi Hikumeta Herêma Kurdistanê re diyalog û pêwendiyên baş yên li ser esasê cîrantiyê bi pêş bixe.

Partiya me, giringiyek mezin dide pêwendiyên dostane yê navbera tevgera kurd ya hemû parçeyên Kurdistanê re."

Herweha, di Komcivîna 4' an ya Asayî ya Partiya Maf û Azadiyan de hin biryarên nû hatin girtin;

**Biryara 1' an;**

Partiya me diyar dike ku mafê perwerdehiya bi zimanê zikmakî, mafekî jêveneger e. Herweha, destnîşan dike ku perwerdehiya bi zimanê zikmakî ya bi kurdî (zaravayê kurmancî û zazakî-kirdmanckî), yekser têkiliya xwe bi çareserkirina pirsgirêka kurd ya bi şêweyê demokratîk û aşîtiyane ve heye.

**Biryara 2' an;**

Şert û mercên navneteweyî û herêmî ji her demî bêtir derfetên giring diafirînin ku pirsgirêka Kurd, bi şêweyê demokratîk û aşîtiyane bê çareserkirin. Ji aliyê Komcivîna me ve hatiye tespîtkirin ku divê Hikumet û Parlamentoya Tirkiyeyê, derbarê çareserkirina pirsgirêka Kurd ya bi şêweyê demokratîk de hê zêdetir xwedî înîsiyatîf be û ji bo dawîleanîna şer û pevçûnên heyî, pêngavên pêwîst biavêjin.

**Biryara 3' an;**

Ji aliyê Komcivîna me ya 4' an ya asayî ve wek pirensîb hatiye pejirandin ku divê hemû dezgeyên partiya me, di hemû xebatên xwe de bikaranîna zimanê me yê zikmakî yê Kurdî bidomînin.

**26' ê Çiriya Pêşîn 2010**

www.arsivakurdi.org

# Besîc dareke bê reh û rîşal



Fatih Salihî

Besîc çemkek darêtî a Îslamî ye ku piştî hatineserkar a hikûmeta melayan û fermana Xumênî di 5 ê Xezelwera 1358 a Rojî ve hate nav wêjeya dewkî ya xelkê. Di rastî de em dikarin bêjin ev çemke di dirêjiya dirûşma "ne rojhelat ne rojava, tenê Komara Îslamî" derket holê, yan jî bi wateyek dirusttir dikarin weke çemkek çep a Îslamî pênase bikin.

Lê bi her awayek be, di vir de mebest ji vekolîn li ser wê peyvê nine, belkî ew pirose ku kesek an komek bo meremeke taybet û diyarîkirî tên amadekirin û armanc û bingeha çêbûna wê çemkê ku di rewşa niha de hemû sîstema hînkirina Îranê di hemû astan de bi taybetî di astên destpêkî, navendî û paşnavendî de dagirtiye.

Dema ku di sala 1358' an de Xumênî fermana dirustkirina Besîc derkir, kesê nedizanî ku şereke malwêranker di rê de ye ku niha jî şûnwarê wî şerî bi ceste û pêykera civakê ve diyar e. Besîc her weke bixwe dibêjin, yanî bê hizrîn û têfikirîn, vexwarina cama sûr a şehadetê û çûna bo beheşta sozdayî. Bo gihîştin bi wê armancê, karbidestên Komara Îslamî di qutabxaneyan de sermîye danîn û liqek bi navê "Besîca Qutabî" di hemû qutabxaneyên Îranê de vekirin. Hêjayî gotinê ye ku di dirêjiya şerê 8 salî yê Îran û Îraqê de ligor amarên rejîmê 36000 qutabî ên besîc canê xwe ji dest dan û bi hezaran kes jî dîl, bêser û şûn û kêmendam bûn. Eva jî di halekê de ye ku ew kar ligor berevajî hemû kunvansiyonên navnetewî û baştirîn belge ye bo eyankirina wê mijarê ku karbidestên Komara Îslamî bi tu awayekê nikarin xwe li gel yasa û rêsayên navnetewî û girêbestên mirovdost biguncînin.

Pîlanrêj û kumpiloçiyên rejîma melayan bo wê mebestê rû kirin qutabxaneyan û li ser zarok û nûciwanên Îranê bernamerêjî kirin ku ev qonax ji temenê mirovan, qonaxa herî hesas û hestyar a temen û baştirîn dem e bo şîwe û şekildayîn bi bîr û hizrên zarok û nûciwanan. Çimku ligor çavkaniyên zanistî û derûnnasî, serdemê nûciwanî weke yek ji girîngtirîn serdemên temenê mirov, bi curekê kesayetiya tekekesî û civakî a mirovan şekil dide, bi awayek ku di pêşerojê de her cure nurm yan dijenurmek ku ji helwesta tak pêk tê, vedigere bo şîweya perwerdekirina wî kesî di serdemê nûciwaniyê de, bi wateyek din dibe bêjin ku şekilgirtina kesayetiya tak li gel şîweperwerde û fêrkariya wan li serdemê zaroktî û nûciwaniyê de peywendî heye. Her eve jî bûye egera wê yekê ku rejîm li ser wê qonaxa temen de sermiyedanînê bik. Lewma Besîc Qutabî li sala 1375' de bi fermî weke yasa di Perlemana Şêvra Îslamî de hat pesendkirin, lê di serdemê bi nav reformîstan de heya radeyekê hat piştguhxistin. Herçend piştî hatineserkar a Ehmedînijad qerebûya wan 8 salan hat kirin û bi awayek micid kete ber bas û di heyeta dewletê de jî bi fermî kete xaneya cîbicîkirinê de.

Bi besîckirina qutabiyan di dehsala 70 yan de bersiv da, çimku pirraniya ew kesên ku amade bûn xwe bo rejîmê bidin kuştin, temenê wan di navbera 12 heya 18 saliyê de bû, eva jî vedigere bo nenasîna naveroka rastîn a karbidestên rejîmê û naveroka sereke ya nîzama Komara bi nav Îslamî. Ew hêza bê perensîp û bêser û ber bi hêviya çûn bo beheştê bi bê wê yekê ku di warê serbazî de jî şarezayî hebe, rû kirin çeperên şerr û bi gotina karbidestên rejîmê rolek berbiçav dîtine li tepeseriya azadîxwazên Îranê û şerrfirotin bi xelkê azadîxwaz yê Kurdistanê. Girîngtirîn tiştê ku di vir de dikeve ber bas, ev e ku di salên dehsala 70 yan de çûn bû qutabxaneyan, rejîmê hewil dabû di riya olîkirina deqên dersî û baskirin li şehadet û rewayîdan bi terorê, nifşekê ji xwe re çêke ku di dehsala duyem a desthilatdariya wan de bibe çeka destê wan, lê ew hêviya rejîmê bûye dûkel û çû hewa. Yekimîn nerazîtiyên giştî ên sala 1378 a rojî a zanîngeha Tehranê, faktereke bo eyankirina wê mijarê ku rejîm li nivîsandin û komkirina pirtûkên dersî bi mebesta zindîragirtina çanda besîcî serketî nebû û bi awayek fermî şikest xwar. Çimku raste temenê zarokî û nûciwanî hestyartirîn û baştirîn qonax in bo perwerandin û hînkirinê, lê nabe vê yekê ji bîr bikin ku hînbûn piroseyek civakî ye ku tenê di qutabxaneyan de nahê kurtkirin, belkî per bi perê jîngehê, malbat, koma hevalan, civak û ragihandinên giştî hemûyan bandor û kartêkerî heye li ser piroseya hînbûnê. Pirsek ku Komara Îslamî bêzar heresan kiriye. Niha ku teknolojî û zanyariyan wisa kiriye ku qutabî bi sanahî bi pîlanên hînkirinê nahên xapandin. Belge ji bo pûçbûna armancên rejîmê ji bi besîckirina qutabiyan pêlên berîn ên nerazîtiyên sala borî bû ku hemû hêviyên rejîmê kirin bulqên ser avê.



Lewma tirs ketiye dilê rejîmê ji bo berxwedan li hember wê nifşa nerazî a ku li dehsala dawî a sedsala 14'an de, heresan kiriye, ketiye bizavan û naveroka pirtûkên dersî bi tewawî guherîne û bi hemû awayekê li ser çanda besîcbûn û şehadetê kar dike, lê her wek me amaje pê kir, bi xatircemî ve di wî karê xwe de jî serketî nabe, çimku piroseya hînbûnê tenê bi qutabxane û pirtûkên dersî berteng nabe û zanyariyên giştî û teknolojiya zanyariyan di salên pêş de derdixin ku Besîc darek bêpelg û bê rih û rîşal e ku ber bi hişkbûnê ve diçe.

www.arsivakurd.org

**RONÎ**

**Quncikek ji bo şiroveya bûyer û babetan ji xwendevanên "Agirî" re**



**Ebdulla Hicab**

# Kampa leşkerî

Hewldana Komara Îslamî ji bo guherîna babetên xwendinê bi taybet di beşa civaknasiyê de li zanîngehên welat hê berdewam e. Di wê dema dawî de karbidestan çarçoveya ku dixwazin ji bo sîstema perwerdeya nû ya welat dabinên eşkere kirin. Li gor daxuyaniyên tên, wê îdeolojiya fermiye Komara Îslamî ku li ser bingeha dijberî, dijminkarî, tundajoyî, nefret û duçavkiyê hatiye damezirandin hê zêdetir bikeve nav berperên pirtûkên xwendinê û bi yekcarî şûnwarên perweredeya zanistî li welat bê binbir kirin. Pêvajoya fanatîzekirina sîstema xwendinê, li gor rêveberên rêjîmê, wê berfireh be û hem zanîngehan û hem jî xwendingehên navendî û paşnavendî bigre hundirî xwe.

Piştî rexneyên dubareye Xameneyî ji sîstema perwerdeya zankoyên welat û daxwaziya wî ji bo guherîna naveroka perwedeya civaknasî (sosîolojî) û hemû liqên xwendinên girêdaiyê zanista civakî, niha jî dem gîhaye pêgavên piratîk ji bo guherîna sîstema perwerdeya rêjîmê. Wezîrê perwerdeya Komara Îslamî, "Hemîd Riza Hacî Babayî", di wê dawiyê de diyar kir ku sîstema perwerdeyê heya niha bersiva îdeolojiya rêjîmê nade, û babeta sereke ya projeya guherandina sîstema perwerdeyê zêde vekir. Wezîrê perwerdeyê, xala serke ya siyaseta perwerdeya nû ava kirina "autobana (mezinriya) şehadetê" bi nav kir.

Li gor wê pilanê, perweredya civaknasiyê li Îranê wê ji niha û pêve riya xwe bi yekcarî ji zanista civakî ya ku li zanîngehên cîhanê tê dersdan, veqetîne û xweserî bikeve rêçikek nû. Hemû îşare û nîşanên ku tên, derdixin mebest ji wê xeta nû ewe ku sîstema perwerdeyê bikeve xizmeta raste raste rêbaza tundajo, demargirj û mirovkujî bi riya metoda xwekujiyê, heya ku pirojeyên pêşerojê yên terorîstiye Komara Îslamî bi têra xwe berendamên perwerdekirî yên karên terorîstî hebin.

Serbarî wê hewldanê, niha mîlîşên Besîc jî dixwazin babetên perwerdeya leşkerî ku di xwendingehên navendî û dwanavendî de dihatin dersdan, zêdetir biguherin û ber bi perwedeya şerê xwekujî u xweteqandinê ve bibin. "Muhemd Riza Neqdî" serberpirsê mîlîsên Besîc di şiroveya xwe ya dawîn de li ser naveroka dersên di derbarê "perwerdeya parastin" de ku li xwendingên Îranê tê dan, ew babet zêde "hişk u kilasîk" nirxandin u ji bo vejiyandina perwerdeya "parastinê" got ku ew wê babeta "Şihadet" derbasî nava perwerdeyê bikin heya ku ew babet hinekê bê vejiyandin. Bi gotina Neqdî, ji niha û pêve wê destwerdana wan di babeta xwendin û perwerdeya di xwendingehan de hê zêde û bi awayê xweserîxwe û raste rast be.

Ger felsefeya Komara Îslamî derfeta gulvedana zêdetir bibîne, ji niha û pêve dibe em li bendê bin ku li ciyê sosiyolojiya dînî û siyasiye "Max Weber" (1864-1920) fîlosofê Almanî yê xwedî bandor di zanista siyasî û metodolojiya sosiolojiyê de, bîranînên Mela Heseni, pêşnimêjê Urmiyê ku bi dînitî, derevînî û sadîsmê tê nas kirin, li xwendingehên Îranê bên xwendin. Mela Hesenî li sala 1981 kurê xwe, Reşîd, ku bi metodên hovaneye babe xwe re nebû û amade nebû bikeve xizmeta Komara Îslamî, girt û ji bo îdam kirinê da destê Sipaha Pasdaran. Dema Reşîd bi destê Pasdarên girêdayî bi babê wî re hate îdam kirin, Mela Hesenî weke cejna "paqij kirina malbata xwe ji dijberî şoreşa Îslamî" şahî kir. Ew her weha darêjerê pilana komkujiyên Qarna, Qelatan, Gêçê û çendîn deverên din yên Kurdistanê ye.

Li gor reforma nû ya Komara Îslamî, ji niha û pêve êdî wê babetên zanistiye fîlesofên Feranseyî Auguste Comte (1798-1857) u Emil Durkheim (1858- 1917) ku perweredya civakî ji bo çê kirina hevdengiya civakî u ava kirina sîstema ku wekhevî û mafê mirovan ji xwe re bingeh digre ji sîstema perwerdeya welat bê derxistin. Li ciyê wê civaka ku Hucetulîslam Danişmend dixwaze, civaka ku bêhurmetî kirin ji ol, kesayetî u nasnameya her kesê ji xwe bi der bibe mijara perwerdeyê. Danişmend yek ji şêvirmendê Xameneiyî û yek ji kesayetiyên xwedî deselat di Komara Îslamî de ye ku bi dijmindariya bi bisilmanên Sunne u bêhurmetî kirin ji xelîfeyên bisilmanan re tê nas kirin.

Li gor pilana guherîna babetên xwendina zanîngeh û xwendingehên Îranê, wê ji niha şûnde li ciyê felsefeya abûriye fîlesofê Alamnî "Karl Marx" (1818- 1883), wê gotina naskiriye Xumênî di derbarê abûriyê de "Abûrî ya heywana ye" bibe bingeha perwerdeya abûrî.

Li ciyê humanîzma "Jean-Paul Sartre" yê Feranseyî (1905- 1980), dibe xwendekarên îranî ji niha û pêve "şehadetxwaziya" Ehmedînijad û Xamneyî bixwînin. Li ciyê felsefeya eqlaniyetê (rationalism) a fîlesofê Feranseyî René Descartes (1596- 1650) û ya zanayê Hollandî Benedictus de Spinoza (1632- 1677), gotinên Ehmed Xatemî bibin bingeha perwerdeyê. Bedela felsefeya abûrînas û sosiolojê Almanî Carl Emil Weber (1864- 1920) wê Tewzîhulmesayêla Xumeynî, hikayet û rezaletên hucetulislam Danişmend an derevên Ayetullah Cenetî bibin babetên xwendinê.

Cenetî dema ku Ehmedî Nijad jêre basî xermaneya nûra ku bi gotina wî di dema axaftina wî di civîna Civata Giştiyê Neteweyên Yekgirtî de li dor serê wî xuya kiribû, ew yek bi nîşaneya hatina "Îmam Zeman" û Ehmedînijad weke kesê hilbijarde bi nav kiribû. Cenetî her weha yek ji wan kesa ye ku îxbariya kurê xwe yê rexnegir ji komara Îslamî kir û ew bi destê hevpeyman û hevbîrên xwe da kuştin. Dema kurê wî, Muhemedhusên Cenetî ji xeta rêjîmê derket û li hember sîstema kewneparêz de sekinî, lewma jî neçar ma xwe veşêre, Cenetî ehd kiribû ku dema ew bê kuştin ji xweşiyan 40 rojan bi rojî be. Muhemed Husên sala 1981 (1360) bi destê Pasdaran li Îsfehanê hate kuştin û Cenetiyê bab gîha armanca xwe.

Bi kurtî dema karbidestên Îranê derfetê bibînin ku xeleka nû ya reformên perwerdeyê di zanîngeh û xwendingehên welat de birêve bibin, mîkrobeya îdeolojiya Komara Îslamî wê bi awayekê bingeha perwerdeya welat bilewitîne ku bi salan li pey tevçûna rêjîmê re jî neyê paqij kirin. Lewma her rewşenbîr, mamosta û kesayetiyek xwedî berbirsiyarî li Îran û cîhanê pêwîste wê metirisiya mezin bibîne û di hember de bisekine. Perwerde bingeha ava kirina civak û nivşên pêşerojê ye. Ew 30 salin ku Komara Îslamî li herêma Rojhilata Navîn û cîhanê toyê netifaqî, dijminkarî û kevneparêziyê direşîne. Weke ew hemû xedr û cinayet têr nekin, niha karbidestên Îranê qonaxa lewitandina bingeha perwerdeya civakî û civaknasiyê dide destpê kirin. Ew pêgav ji hatine ser kar a Komara Îslamî bi xwe bi zerertir û bi metirsîtir e. Ji ber ku rêjîm dixwaze ji niha û pêve hemû Îranê bike kampek leşkerî ku têde her takek girêdayî bi rêjîmê tê erkdarkirin ku bi riya xwekujiyê felsefeya Komara Îslamî biparêze û bi pêş bixe.

www.arsivakurdi.org

# Rejîm Rê Nade Li Zanîngeha Urmiyê Civînên Kurdî Bihên Lidarxistin



Izna birêveçûna civînek Kurdî li bajarê Urmiyê hat betalkirin.
Piştî ku çend xwendekarên zanîngeha bajarê Urmiyê bi hevkariya Civata Edebî a "Ehmedê Xanî" izna birêvebirina civîneke edebî bi navê (Mafê Famkirinê) ji aliyê Îdareya Îrşad a bajarê Urmiyê wergirtibûn, ji aliyê Îdareya çandî a zanîngeha bajarê Urmiyê, îzinname bêbingeh hat nasîn û rê nadin tu bangeşe û ragihandinek di nav zanîngehê de ji bo rêvebirina civînêPbê kirin.
Hêjayî gotinê ye biryar bû hin ji edîb û hunermendên deverê wek Ezîz Şarox û Kawûs Mîlanî jî di vê civînê de beşdar bin.
Eva jî di demekê de ye ku Ehmedînijad di gotinên xwe yên heftiya borî de gotibû li zanîngehan mafê çalakiyên netewî ji bo netewên ne Fars heye. Lê eva cara yekemîn nine ku rejîm li Rojhilata Kurdistanê pêşî ji birêvebirina civînên edebî digre.

# Werzişvanekî Kurd Li Kêbirkêya Boksê ya Fenlandê Mîdala Zêr Bidest xist

Ciwanekî kurd ê xelkê bajarê Şino û akinciyê welatê Fenlandê bi navê Reşîd Şahî, di kêbirkêya baştirîn boksorên welatê Fenlandê, li kêşa 60 kîloyî, mîdala zêr bi dest xist.
Navenda Nûçegihaniya Kurdistanê, di vê derheqê de xuya kir Reşîd Şahî, akinciyê bajarê "Lahitî" a welatê Fenlandê ye û li 15 saliyê, di vê rişteya werzişî de kar dike û di heyamê 2 sal û nîvan de serkevtinên berbiçav li vî warî bi dest aniye. Navbirî heta niha 15 mîdalên zêr û 10 kapên zêr û zîv, di kêbirkêyên hundirî û derveyî welatê Fenlandê bi dest xistiye.
Hêjayî gotinê ye, ev werzişvanê Kurd, niha mijulê xweamadekirinê ye bo kêbirkêyên Olempiyada sala 2011'an.

Rojev

# Siyaseta Îranê li Efxanistanê: Şirîkê dizan û hevalê karwançiyan

**Selîm Zencîrî**



Belge û dukumentên ku li çend rojên derbasbûyî li dezgehên ragihandinê de hatin weşandin, carek din eyankerê siyasetên mirar û biyom yên Komara Îslamî û pîlanên veşartî yên rejîmê li welatên deverê weke Efxanistanê de digehînin. Mijara şandina hevkariyên malî û pereyên nexd ji aliyê Komara Îslamî ve bo Hamid Kerzay, Serokkomarê Efxanistanê jî li vê çarçoveyê de bû rojeva medyayan. Çîroka dana wî pareyî ji riyên nedîplomatîk ve ji aliyê balyozê Îranê bi Umer Dawudzay, serokê buruya Serokkomarê Efxanistanê, li halekê de ketiye ser zaran ku nûçeya hevkariyên malî û şandina pere bi Talibanan jî li rojevê de ye. Ew belge ku li rojnameya Niyoyork Taymzê de hatin belavkirin, îşare bi neqş û rolê xirab yê Komara Îslamî li Îraq û Efxanistanê de dikin ku li gor wan li Îraqê de çarçoveya pîlan û desttêwerdanên Komara Îslamî ji hevkariyên madî, locestîkî, çek û teqemenî û perwerdeya leşkirî bi şoreşî û terorîstan derbas bûye û gelek berfirehtir û pê awêtiye bernamerêjî û kumpiloyên ji bo operasiyon û bi armanc girtina rayedarên Îraqî yên dijberê rejîma Îranê.

Mijara dana pereyê nexd bi Hamid Kerzay ku li destpêkê de ji aliyê rejîma Îranê ve hat mandel kirin û paşan neçar ma ku îtirafê pê bike, nîşan ji du siyasetan li Efxanistanê de ye, bi wateyek din eyankerê siyasetek dualî li wî welatî de ye. Ji aliyekê ve hevkariya dewleta Efxanistanê û hewla kirrîna siyasetvan û parlemanterên wî welatî dide. Ji hêla din ve jî piştevanî û hevkariyên madî û locestîkî bi girûpên neyar û tundrew weke Talîbanan dike.

Bi vê çendê jî him siyasetên dijî Îsraîlî û Amerîkayî li deverê de pêş dixîne û eniya li dijî wan xurt dike, him jî alozî û tundûtûjiyan xurttir dike û li her du haletan de pêgeha xwe bihêz û wan neçar bi terikandina deverê dike. Lewma hewce ye serbarê nîgeranbûn ji wê siyaseta dualî, rêçareyekê ji bo qutkirina destê rejîmê bibînin.

Çunku ew hevkariyên bi Hamid Kerzay û dewleta wî ne ji ber çavên reş û belek yên wî û ne jî bi armanca cihgîr kirina ewlehî û aramiyê li Efxanistanê de ne, belkî tenê bo peçavtina hevkariyên bi şoreşî û Talîbanan, herweha bêdengkirina berpirsiyarên Efxanî û hevterîb kirina wan li gel siyasetên xwe de ye.

Herweha ew hevkarî diselimîne ku rejîma Îranê li hemû welatên deverê weke Lubnan, Xeze, Îraq, Yemen û ...hwd bi mezaxtina pere û dana bertîl û rişweyek zaf ji xizêneya giştî ya welat çawan têdikoşe ku piştewaniya wan bo aliyê xwe misoger bike. Dîsa dide xuya kirin ku pere, çeka sereke ya Komara Îslamî û beşek stratejîk ji siyaseta derveyî a rejîmê ji bo ragirtina xwe û parastina balansa hêzê li deverê de ye, ku eva jî li raya giştî ya cîhanê re ne tiştek nû ye.

Lê ger rejîmê karibe li Lubnan, Xeze û li wî serê dunyayê de weke Afrîqa û Amerîkaya Latîn de pêgeha xwe hinekê qahîmtir bike û serokên wan jî bi rûyek xweş û geş ve gazî Îranê û paşan jî bi rê bike, carnan jî bi wan bide qebûlandin ku bi bejn û bala Komara Îslamî de bixwînin, ne jiber rûmetê - geş û ronahîyê Xamineyî û siyaset û mêraniya Ehmedîko ye, belkî ji ber wan pereyan e ku li berîka xelkê Îranê û samana giştî ya Îranê de didizin û mêrxasiyan pê dikin! Lê li navxwe de deverên paremayî ku li dest nebûna xizmetguzariyan de dinalînin û xelkê belengaz û hejar yên Îranê jî ku li nav hezaran kul û xem û nerihetiyan de dijîn, ji bîr dikin. Ma gelo qey ew, çelengî û mêrxasî ye? Ma ev yeka heya kengê dê ji wan re biçe serî? Ma ew siyaseta wan heya kengê dê birr bike? Ma yên ku bi pere û diraw bên kirîn, rojekê jî bi pere pişt ji wan nakin? Ma çiqas dikarin bi vê siyaseta dualî a xwe him bibin şirîkê dizan û him jî bibin hevalê karwançiyan? Yan him li nal bidin û him jî li bizmar?

www.arsivakurd.org

# Avabûna yekem qutabxaneya kurdî

**Baram**

Yek ji girîngtirîn basên ku li nav civakê de divêt bihê liberçavgirtin, geşekirina çandî û qala çandî ye. Pênase û çemka geşandinê ji şerê duyem yê cîhanî ve heya îro bi tewahî guhertin bi ser de hatiye. Çemkên destpêkî ji çandê, li ser bingeha çendatiya aborî û êlmanên aborî, weke radeya berhemanîna nepaqijiya netewî, dahata serane, berxora enerjiyê, berxora pola û … nasênerê asta xurtbûn û geşekirin yan paremanê bûn. Lê li dehsala 70'ê a Zayînî ve êlmanên civakî jî bi êlmanên geşekirinê zêde bûn.

Serhildana bûyerên cur bi cur li dehsala 80'ê a Zayînî de bîrokeyên wê zêdeter ji berê anîn ser vê bawerê ku sedemên çandî li hemû tişteкê pêtir li geşandinên civakî de bandora wan heye û kêmasiyên bîrokeya aborî xurtbûn û geşandina xwe zêdetir derxist.

Geşandin, bi hînkirin û zaniyarîdan û berhevkirina bîr û hizra giştî ji bo mifahstandin ji hewcehiyên madî û menewî heye. Li vê navberê de rola sîstema hînkirin û perwerdê li gel ragihandinan de bi taybetî weşanan weke du ji paramîtrên girîng yên geşandina çandî xwe derdixin û li civakê de bi şêweyên zaniyarî gihandin û jordeçûna radeya xwendewarî, hînkarî, bi geşandina tevalî ya civakê alîkariyê didin.

Sîstema fermî a perwerde û hînkariyê li rex weşanan bi taybet rojname, aleva herî bi qazanc û erzan e ji bo jordebirina asta zaniyarî a takên civakê û xebat li dijî nezanî û bêagayiyê tê hejmartin.

Ku waye em dikarin bibêjin ku:

1: Çand bingeha geşandinê ye.

2: Serxwebûna çandî, sedema sereke ya geşe kirinê ye û girêdayî bûna çandî jî sedema sereke ya paşketina çandî ye.

3: Hînkirin û perwerdeya mirov, merca sereke ya geşandin û armanca wê ye.

Lewre ye ku beşek ji şehreza û bîrmendên kurd, Simayîl axayê şikak bi bavê nasyonalîzma kurd didin nasîn. Vê hesibandinê jî ger bi durustî vekolînê li ser bikin û êlmanên geşandina mirovî û çandî binirxînin, tê dîtin ku gotinek bi tewahî rast e û kesatiya Simayîl Axa û kar û kiryarên wî li serdemê şoreşa şehîd Simko de vê rastiyê diselimîne ku çima hemû welatên cîran yên kurdistanê, dujminê tevgera Simko û Simko bi xwe bûne.

Ev gutare bas ji wê dike ku Simko li wan salan de çiqas kesatiyek bîrtîj û netewî bûye ku hewil daye ji riya belavkirina kovara "Kurdistan" tevî Ebdulrezaq Bedirxan li bajarê "Xoy"ê li sala 1912'an û herweha avakirina "Civata rewşenbîrî a kurd" bi hevkarî û alîkariya Ebdulrezaaq Bedirxan li sala 1913'ê de bi navê



"Cîhandanî" ku yekemîn karên wê civatê ne, avakirina yekemîn qutabxaneya kurdî li sala 1913'ê li bajarê "Xoy" bo zarokên kurd û herweha anîna çapxanê bo bajarê Urmiyê û derkirina rojnameya "Roja Kurd" ku organa nawendî ya Tevgera Simko bû, ew rastî selimand ku Simko heya çiqas giringî bi hokarên sereke yên pêşketin û geşandina çandî daye.

# Serketina Berbiçav A Komarîxwazan Di Hilbijartinên Amerîkayê De




Partiya Komaraîxwaz di hilbijartina wê carê ya Perlemana Amerîkayê de karî zorahiya kursiyên wê Perlemanê bidest bixe û kuntirola Perlemanê bigre dest xwe. Di hilbijartinê de, serbarî hemû hewlên Demokratan di piropagendeyên hilbijartinê de, lê Komarîxwazan bi hevkariya partiya binajoxwaz a "Tî Partî" bi mifah sitandin ji zêdebûna nirxa bêkarî û berdewamiya kirîzên abûrî, encama wan hilbijartinan bi qezancê xwe guhert û serkevtin bi ser Demokratan tomar kir û ji 435 kursiyên Perlemanê, 236 kursî bidest xist. Hêjayî gotinê ye ku di Senaya Amerîkayê de Demokratan, karîn pêgeha xwe biparêzin, lê bi hejmarek kêm yanî 10 kursiyan, ewa jî nîşana wê yekê ye ku Demokrat bi giştî li Amerîkayê lawaz û bêhêz bûne.

Ji aliyek din ve, Komara Îslamî ji encama wê hilbijartinê nîgeran e. Malpera hikûmetî ya rejîmê "Tabnak" nivîsandiye: "Nêrînek bi ser rojname û malperên Amerîkî di wan rojane de wê yekê nîşan dide ku pêvajoya binajoxwaz a Komarîxwazan serkevtin bi ser Demokratan de misoger kir û tenê riya derbazbûna Obama ji bo bi qenaetgihandina xelkê Amerîkayê bi xwe, ji bo gera duyem a hilbijartina Serokkomariyê, êrîşa serbazî ye bo ser Komara Îslamî.

# Sarkozî: Ger Mûyek Ji Serê Sekînê Kêm Be, Ezê Têkiliyên Me Bi Îranê Re Bidim Qutkirin



Li gor feylesofê naskirî yê Firansî, Birnar Hinrî Luy, Serokkomarê wî welatî, Sarkozî, li pêwendiyek telefonî de gef li berpirsên Îranî xwariye ger mûyek ji serê Sekîne kêm be, dê gotûbêj û têkiliyên xwe bi Îranê re qut bike.

Sarkozî berê derbarê destavêtina xwe yên rasterast di çarenivîsa Sekînê, hişyarî dabû. Tê gotin gefên tund ên Sarkozî piştî piştrastbûna berpirsên wî welatî ji cîbicîkirina biryara berbarankirina Sekîne Mihemedî Aştiyanî hatiye xwarin ku roja 2ê Novambrê ji aliyê Komîteya Navnetewî ya Dijî Darvekirin û berbarankirinê, hişyarî di vê derbarê hatibû dayîn.

# Azadiya çapemeniyan di Îranê de bertengtir dibe



Şerîf Fellah

Di rapora sala 2010 a saziya nûçegihanên Bêsînor de ku bas li azadiya çapemeniyê di welatên cîhanê de dike, hatiye: Komara Îslamî bi daketina 3 pileyan li hember sala 2009 an, pileya 175 a wê rêzbendiyê ji xwe re tomar kiriye.

Binkeya sereke ya saziya nûçegihanên Bêsînor li Parîsê, dehan kes weke vekolerên şareza û pispor di warên: vekolîn, komkirin û darêtina nûçe û zanyariyên nû ên rojane û bidûdeçûn, îdarî, malî û peywenî mijûlî karin û çavdêriyê bi ser xebat û çalakiyên sazî û pêkhateyan bi awayeke hûr di deverên cuda cuda ên cîhanê de dikin.

Saziya navnetewî a nûçegihanên Bêsînor, di heyamên salên çalakiyên xwe de toreke berîn a pêkhatî ji sedan nûner û hevkar di seranserê cîhanê de pêk aniye. Di encama nûçeyên wê tora berîn ku rojane komek zanyarî û nûçe di warê azadiya çapemenî û rewşa nûçegihanan di seranserê cîhanê de digîjin wê saziyê, heya ku her dema rojnameyek yan jî rojnamevanek li her quncikek cîhanê de, gef û metirsiya daxistin an kuştinê li ser be, Nûçegihanên Bêsînor di cih de û bilez derkeve holê û wê kiryarê liqaw bide.

Bi parvekirin û polînbendî a cuxrafiyayî, Afrîqa, Ewropa, Amerîka, Asyaya Başûr û Rojhilata Navîn, berdewam bi awayek rojane, karê vekoleran, rêporterên bêsînor, komkirin, rave û şîroveya nûçe û zanyariyan, ajansên nûçegihaniyan, çapemeniyên cîhanê û ew rêjeya berîn û li rade bider a belavokên taybetî ku pêtir di warê binpêkirina azadiya çapemenî, bîr û ra û dûdeçûn di warê bertengkirina derfetên nivîsandin, nûçe û zanyariyan vekolînê dikin. Nûçegihanên Bêsînor piştî vê yekê ku bi tewawî di warê rastî û dirustiya nûçeyan xatircem û piştrast bû ku di riya nûnerên deverî, yan saziyên dakokîkar û çalakên mafên mirovan û azadiya çapemeniya deverê ve, ku bixwe beşek girîng a wî karî ye, wajoya pejirandinê jê dihê dayîn, vekoler û şareza cur û şîweya dijkiryar û helwesta wî karî destnîşan dikin. Ew helwest û dijkiryar hin caran bi awayê ragihandina çapemenî û hin caran jî di riya namê ve berpirsên welatan û aliyên peywendîdar jê tên agehdarkirin.



Hin caran ji bo hin bûyer û pirsên girîng, tenê agehdarbûn û komkirina nûçe di riya dûr ve, nabe armanca wê saziyê, lewma di rewşek wiha de, nûçegihanên Bêsînor, heyeta nûnerayetiyê dişîne cihê bûyeran di deverên cuda cuda de. Di wan mimûriyetan de, nûnerên Nûçegihanên Bêsînor, li gel berpirsên hikûmetî, dîplomatên biyanî di wan deveran, çapemeniyên xweser û dewletî û civatên rojnamevanan yan jî parêzerên mafên mirovan, hevdîtinan dikin li gel parêzer û malbata goriyên bûyeran jî got û bêjan dikin.

Ligor rapor, dûdeçûn û vekolînên heman saziyê, Îran di cîhanê de yek ji wan welatan e ku di warê azadiya çapemenî û ragihandinan de di rewşeke nebaş û aloz de ye û seqayeke ewlehî û polîsî, tirs, biecandin û sansor bi ser çapemenî, nivîsandin û rojnamevaniyê de zal e. Daxistina rojname, kovar û heftînameyan, destbiserkirin, gef, lêdan, azar û îşkenceya nav girtîgehan de û derkirina hukmên nerewa ji bo nivîskar û rojnamevanan, çend mînakek in ji kiryarên rejîma zal bi ser Îranê de li hember çalakên rojnamevanî de. Di wî warî de, Kurdistana Îranê weke landik û çepera berxwedanê, nivîsandin û afirandinê çend qat zulim jê tê kirin û rojnamevan û çalakên medenî, çandî û çendîn rojnamevan di girtîgehan de ne û heta hukmê îdamê jî ji wan re hatiye dan.

Di Kurdistana Îranê de, hemû rojname, heftename û kuvarên xweser û bêalî hatine daxistin û tu dezgehek ragehandin û medyayeke xweser û serbest ji holê nine, çimku ligor yasayên Komara Îslamî tu rojname, sazî û dezgehek çapemenî û ragihandinê ger di xizmet armanc û îdolojiya nîzamê de nebe, îzna weşanê pê nahê dayîn.

Saziya nûçegihana bêsînor li sala 2002' an ve heya niha raporên xwe di warê azadiya çapemeniyan di seranserê welatên cîhanê de bi awayê salane belav dike, wê carê jî pêristek ji rêzbendiya welatan di warê azadiya çapemeniyan de xiste rû, ku di wê rêzbendiyê de, Komara Îslamî di nav 178 welatên ku vekolîn di wî warî de bi ser de kirine, pileya 175' an heye û piştî welatên Turkmenistan, Kureya Başûr û Erîtrê, cih girtiye. Eve di halekê de ye ku di rêzbenda wê saziyê de ku di warê azadiya çapemeniyê ve çalakiyan dike, Îranê di nav 175 welatan de, pileya 172' an hebû.

Di dirêjiya wê raporê de bas ji rewşa çapemeniya welatên Rojhilata Navîn hat kirin ku Komara Îslamî weke salên berê, ne tenê baştir nebûye, belkî berbi xirabbûnê çûye û pileya xwe di dawiya wê rêzbendiyê de parastiye.

Di wê raporê de, pêdagirî li ser tepeseriya rojnamevanan, hevwelatiyên çalak ên warê înternêt û wêblagnivîsan hatiye kirin û ligor heman rapor, piştî aloziyên hilbijartinên sala 1388 a Rojî di Îranê de, tepeserî û astengên înternêtî li Îranê de bi awayeke berfireh zêde kiriye.

Ligor raporên salane ên wê saziyê, rewş û asta azadiya çapemeniyê di Îranê de li sala 2002' an ve heya niha berdewam rû li daketin û lawaziyê kiriye. Ew daketine li sala 2005 an û hevdem li gel sepandina Ehmedînijad weke Serokkomar bi ser Îranê de, bi awayek berbiçav teşene kiriye. Îran li sala 2004' di nav 167 welatan de pileya 158 an hebû, eve di halekê de ye ku pêgeha Îranê di wê rêzbendê de li sala 2005 an, di nav 167 welatan, pileya 146 an hebûye.



www.arsivakurd.org

# Rêvî Dikin Nobedarê Mirîşkan!



Ceifer Mubeşirniya

Civata giştî ya saziya navnetewî dixwaze di riya hilbijartinek giştî, di nav welatên cîhanê de, ji 41 welatan heyetek birêvebiriyê di navenda Jinên Saziya Navnetewî de pêk bîne. Ji wan 41 welatan, 35 welat ji aliyê giropên nahyeyî ve dê bihên hilbijartin û 6 welatên din jî ji nûnerên wan welatan dê pêk bên ên ku di pêxema armancên wê heyetê de çalak dibin û piştevaniya malî a wê heyetê dikin. Di vê hilbijartinê de parzemîna Asyayê mafê 10 endaman di wê hyetê de heye, ku berendamên wê pêk tên ji: Îran, Hind, Çîn, Malizî, Endonozî, Koreya Başûr, Japûn, Qezaqistan, Erebistan û Pakistan.

Erkê vê heyetê ji aliyê beşa jinan ya saziya navnetewî ve hatiye diyarîkirin ku pêk tên ji 4 beşan: Beşa pêşxistina jinan, damezraweya navnetewî ya vekoklîn, hinkirin û geşekirina jinan, bîroya şêvirmendî a taybet bi pirsên regezî û sindoqa geşekirinê ji bo jinan pêk hatiye. Erkê serokatiya wê heyetê, bi "Mîşil Başilê" Serokkomara Şîliyê hatiye dan. Hêjayî gotinê ye ku soz waye ew heyete di destpêka sala 2010 a zayînî de, di hemû warên peywendîdar bi jinan ve, bi taybetî wekheviya cinsî, xut û bihêzkirina jinan û keçan di seranserê cîhanê de, bi fermî dest bi karê xwe bike.

Di nav berendamên parzemîna Asyayê ji bo endametî di wê heyetê de, welatê Îranê jî tê xuyakirin ku seba desthilatdariya Komara Îslamî a dijî jin bi ser wî welatî de, nerazîtiyên berîn ji aliyê sazî û giropên parêzerên mafên mirov û çalakên warê jinan de pêk anîye, ku di hemû ragehandinên wan sazî û giropan de hatiye: endametiya wê rejîma dijî jin, bêhurmrtî bi jinên hemû cîhanê ye.

Di rastî de jî pejirandina berendamiya Komara Îslamî ji aliyê birêveberên kar û barên hilbijartina wê heyetê, bi taybetî ku di jêr çavdêriya saziya Navnetewî de ye, bêhurmetî bi hemû jinên cîhanê ye nemaze bêhurmetiyek mezin bi jinên Îranê ye ku bi rastî derdikeve ne tenê Komara Îslamî belkî desthelatdarên mezin ên cîhanê jî weke alavek ji bo pêkandina armancên xwe mifahê ji jinan distînin.

Ewa ku di vir de eyane, ev e ku hemû ew wlatên berendam ji bo wê heyeta navnetewî di demên cur bi cur de Komara Îslamî mehkûm bi binpêkirina mafên jinan kirine û ji aliyek din ve jî hest bi berpirsayetîkirin li hember jinan de ew bandor li ser wan welatan çêkiriye ku pêşwazî ji wê hewla erênî ya saziya navnetewî bikin û di wê bazneyê de jî bibin berendamê wê pêkhateyê. Guman tune ye ku ji mafên jinan xwdîderketina her welatekê di asta cîhanî de, di qonaxa yekemîn de, rûbirûbûn e ligel desthilatên dijî jin ên Komara Îslamî û hevbîrên wan e. Çimko tu yek ji esl û armancên wê pêkhateyê ên ku di ragehandina wan de hatine, ligel nêrîn û kiryarên Komara Îslamî li hember jinan, ne tenê hevahengî nabe belkî nizîkatî jî nabe û dijî armancên heyeta han in.

Yek ji armancên saziya han, herwek li jor de amaje pê hat kirin, pêşxistina jinan bû. Pêşxistina jinan di çarçûveya hizr, bîr û birêvebiriya Komara Îslamî de dikare çi manayek hebe. Hewildan bo Pêşxistina jinan pêgehandin di warên zanyariyên pêwîst di riya xwandin û têkiliyên wan di kar û barên hikomî û navendên sîvîl û ....



de ye. Lê dema ku rejîma Îranê her sal terhek bi dijî jinan di xwandingehan de derixe holê wêca ji cudakirina keç û xurtên xwandekar û hêcetgirtin ji cil û bergên wan bigre heya ji holêrakirina waneyê dersî ên zanista mirovî ku ew yek taybetî bi dijî jinan hat kirin, çimku seba temisandin û nebûna rolê jinan di wî welatî de, pirraniya xwandevanên zanîngehan ên rişteya zanista mirovî keç bûn ji bo ku di riya wê kanalê ve bikarin xwe pêş bixînin û ji maneya mirovahiyê têbigîjin û ji mafên xwe ên mirovî xwedî derkevin. Gelo asteng ji wê yekê mezintir li ser riya pêşketina jinan di warê fikrî ve heye ku rejîma Îranê dixwaze xwe bike endamê pêşrew û xemxorên pêşxistina jinan?

Vekolîn û hînkirin a geşekirina jinan: Bi bawera min ger ew sazî bixwaze vekolînê li ser sedemên geşenekirina jinên Îranê weke beşek ji jinên bêpar ji mafên xwe di cîhanê de bike, êdî ew yek bêhurmetiyek mezintir û bi nezanzaniya jinên Îranê ye, û pêdvî bi vekolerên nû di asta navnetewî de nine. Ji desthilatdarên welatan ve bigre heya xelkê medenî ên ku hajêyî li ser Îranê hene, dizanin ku wê Komara cehl û nefamiyê biçûktirîn hewil ji bo pêşxistina çand û ji holêrakirina diyardeyên kirêt ên civakî nedaye, ku bandora zêde ya wan diayrdeyan li ser jinan e û pêtirîn nirx di wî warî didin û bi wî derdî ve dinalînin. Ji aliyek din ve rewşa pirr xirab a abûriya xelkê welatek dewlemend yê weke Îranê jiyan pirr zehmet kiriye û wê yekê jî givaşek çendqat xistiye ser jinan. Bandora nedariyê li ser rewşa derûnî a jinan û ji destdana morala jiyanê, lawazbûna rewşa abûrî a xurtan û bi wê sedemê pêkneanîna jiyana hevpar û peydabûna qeyrekiçan û xweşevitandin û ...

Pirsa îtiyadê: teşenekirina îtiyadê bo nav jinan de belavbûna fahişê di wê riyê de, lawazbûna cism û hizra jinên motad û jidestdana evîna xweperveriyê.

Wekheviya jin û mêran xalek girîng a dine wê saziyê ye.

Di vê xalê de Komara Îslamî xwe yekalî kiriye û her pirsgirêkek jî hebe, dixe stûyê şerîeta Îslamê û xwe jî li pişta wê yasaya destkird lê bi navê yasaya esmanî de çeper kiriye ku ji bo her kesî eşkere ye mafê wekhevî yê jinan li gor yasaya esmanî çawa ye. Komara Îslamî jî bi wan xisletên xwe ew tepeserî û mafxariya jinan çendqat kiriye. -Jin nîva mêr e, jin ji bo şahidiyê nabin, jin ji bo postên serokatiyê nabin, jin zeîf e û ....-.

Di rastî de ger Komara Îslamî li ser hewlên xwe micid e ku dê di pêxema pêşxistina jinan di wê saziyê de, xebatê bike, eva goman tune ye ku ew li riwangeyek olî ve bo wê meselê diçe û dixwaze bi bandora şûma xwe di wê heyeta navnetewî de, jinên cîhanê ber bi xewn û xeyalên xwe ên îmamê zemanî bibe, her wek li gotina xwe ya civîna salane a saziya NY de Ehmedînijad Serokkomarê Komara Îslamî pêşniyaza îdarekirina hevbeş a cîhanê dikir û di cihê bername û pirogiramên nû ji bo îdarekirina welatê xwe û rewşa cîhanê, tirîbûna wê saziya cîhanî kir menbera mizgevtê û ket nav xeyalên fetha cîhanê. Bi bawera min him Komara Îslamî fêr bûye ku bi saziya Navnetewî bilîze û him jî wê saziyê ji lîstin bi xelkê Îranê tam dîtiye, ku ji aliyekê xwe dike parêzerê mafên wan û ji aliyê din ve jî desthilatdarên wê rejîma neyasayî û nemeşrû' bi nûneyatiya xelkê Îranê bo civîn û pêkhateyên xwe bang dike.

# Çi Hatibe Serê Me, Ne Çanda Me Ye

**Kewêzer**

Her neteweyek ji bo ku xwe bi navê netewe bi cîhanê bide naskirin, xincî hebûna ax, ziman, şunas û .... gerek çandek taybet bi xwe jî hebe ku helgirê diyarde û edetên kevnar û dîrokî ên wî netewî be. Gelê Kurd jî yek ji netewên kevnar ên li ser wê cîhanê ye ku xwedî çanda xwe ye lê ji bo çanda wî netewî pênaseyek diyar nehatiye kirin û hin bandorên derekî û sepayî xwe vedizîne nav çanda kurdan de.

Hin caran sepandina hin diyardeyan û afirandina hin bûyeran û dubarebûna wan û zaf gotin li ser wan bûyeran dibe sedema vê yekê ku ew bûyer û diyarde di nav neteweyekê de cihgîr bibe û jê re weke dîrokek bihê sebtkirin û ji bo nifşên pêşerojê bibe çand netewî.

Di vê nivîsarê de em dixwazin bas li ser beşek girîng a çanda netewa xwe bikin, ku tu tiştek nine xincî hunera sitrangotinê, çimko berbelavtirîn û diyartirîn beşa çandî a gelê me hunera sitran e, di nav sitranan de jî emê bas li ser sitranên gelêrî, serpêhatî û bûyerên gelê xwe bikin ku di nav civaka me de rolek girîng lîstine. Lê min jêve ye ku ew sitran jî cihê pêdaçûnê ne.

Çi kurdek nine ku guhdariya sitranên kevnar ên li ser bûyer û serpêhatiyên netewa xwe nebihîstibe û weke beşek ji çanda netewa xwe jî nehesibandibe. Lê birastî ew sitran hemû çanda netewa me ne, an gotin û bi awayek eşkerekirina zulm û zora neyarên gelê me û nîşandana derd û êşa wan bûyerên nexwastî ên sepayî bi ser gelê me de ne?


Ji bo lewcudakirin û naskirina beşa çanda resen ya gelê Kurd di wan sitranan de, ger îmkana wê hebe hewce ye mirov ligor dem û dîroka gotina wan sitranan guhdariya wan bike, dê derbikeve ku her dewranek bi sebk, hest, şîwe, lîstinek bi rih û derûna mirov hatine pêşkêşkirin û her yek ji wana bi awayekê taybet bandorê dixe ser mirov. Ewa jî vê yekê derdixe ku hemû ew sitranên ku bi filkulor hatine naskirin, bêjer û eyankerê çanda resen a netewa me ninin, belkî eyankerê wan bûyer û biserhatiyên gelê me ne ku di dirêjiya dîrokê de ji aliyê neyarên xwe ve hatiye temisandin û xaporkirn.

Lê bi bawera min, cihgîrbûna wan sitranan binavê beşek ji çanda netewa me vedigere ser şîweya gotin û jihevanîna bend û başûkên hunermendên gelê me ên ku bi başî êşa netewa xwe hîs dikirin û dizanîn li cihê nivîsandina wan biserhatiyan weke faktên dîrokî bo xelkê xwe bi taybetî ji bo xwedî û nizîkên goriyên wan bûyerên nexweş çawan tiştên nemir bêjin, weke dermanê birînek xedar ji dil û derûna xelkê de cih bigire û ew yek ji bo nifşên piştî wan weke çanda netewî hatibe pênasekirin. Lewra îro tê dîtin ku di cihê wê yekê ku sitranên li ser bûyer û serpêhatiyan weke çavkaniyek yan jî weke hevkariyek ji bo vekolînên dîroka gelê me bihên mifahsitandin, ew sitran weke beşek ji çanda me tên hesibandin.

Bi bawera min, çanda me şînî, girî, xwînrêtin, şerr û pevçûn nine ku pirraniya sitranên hunermendêm gelê me ên berê li ser wan pirsan bûye.



Di vir de renge bo xwandevanan wa bihê berçav ku mebest ji wê nivîsarê gilî û gazinde ji hunermendên gelê me be, lê berevajî, tenê çavkaniya serpêhatî û bûyerên gelê me bi taybetî ên berî hatina ola Îslamê ku di êrîşa sipaya Îslamê de bi giştî hatin jinavbirin, tenê di riya xizmet û erknasiya wan hunemendan



bûye ku niha jî hin ji wan di riya sitranan de hatine dest bi destkirin heya niha.


Min jêve ye ku ger em bixwazin rêz ji wan hunermendan bigrin, berî her tişî, pêwîste bi vekolîn li ser sitranên wan ligor dem û zeman, wan hunermendan weke tomarkerê yekem ên dîroka gelê me di riya veguhastina devkî ya serpêhatî, bûyer û faktên dîroka gelê me bidin zanîn û ew yek bibe nîşanderê jiyana pirr zehmet û nexweş a gelê me û bi awayekê jî bibe çavkaniyek dîrokî, ne beşek ji çanda wî gelî.

Çimku di nivîsandina dîrokê de, her tişt qewimîbe bi baş an xirab, bi zirar an qezanc, bi xwestin yan nexwestî dihê tomarkirin.

Lê di pirsên çandî de, di rastî de ger tiştek hatibe sepandin ligel tiştek xwastî û orf û edetê neteweyekê cuda ye û gerek bihê pênasekirin, herweha gel ji wê yekê bihê agehdarkirin. Çimku me çi xwastibe, çi kiribe û çi pejirandibe û di guhertina desthilatên zal bi ser gelê me de tesîrên derekî rûçikê wan edet û resenan neguherîbe û hêmayên netewa me pêve diryar bin, wêca baş be yan xerab, bihêz û dewlemend be yan bêkêr, ew yek çanda me ye. Çi hatibe serê me bi zor û nexwastî ji aliyê fesad, neyar û xwînmijên dil bi kîne ji gelê me, çanda me nine. Lê ewa ku weke sitran hatine tomarkirin ku bêjerê rastiyeke dîrokî ne, ji ber nebûna desthilatê û her bi wê sedemê jî nebûna xwendevanî û nebûna nivîskar û dîroknivîsan, ji bilî berxwedan û şoreşên Kurdî, take riya nîşandana wî derdî, bo zindîragirtina wan yad û bîranînan, wê demê di sitrangotinê de hatiye dîtin. Di encam de, beşa çandî ya wan sitranan, tenê peyv û hevokên dewlemen û qafye û redîfên wan in. Naveroka wan sitranan diçe bazneya dîrokê de.

# BÊNAVÎ

ADAR JIYA
adarjiyan@mynet.com



Ji taybetmendiyên gelên bindest ên herî balkêş û berbiçav yek jê xweşibandin e. Xweşibandina hêz an jî kesên desthilatdar. Tenê ne xweşibandin jî. Di kesantiya kesên bindest de hewes, xwezîpêanîna hêz û kesên serdest û zoran, hebandin, hejmetkarî, perestin û pêhemilandina wan bi tendêla hev û din dikevin û xwe li şibandineke bêtore digirin. Peyre, nasnameyeke bênav û navnîşan wekî toqa lanetê xwe di stûyê mirov de datîne û wî/wê dîl digire. Bi wê jî nayê ser; ew toqa pelîdî(îblîsî) hin bi hin li şarenûseke domdar û neguherbar dadigere.

Gava ku mirov dêhna xwe dide gel an jî kesên bindest û mêtingeh, ji navê wan bigir heta cil û bergê wan; ji raxistina mala wan bigir heta mazûbanî û mêvandariya wan; ji rabûn û rûniştina wan bigir heta girêdana wan... ango ji tevê jiyana wan a rojane xweşibandin û lasayîkeriyeke bêyom dibare. Ev rewşa kambax û malwêran ne şixulê salekê û du salan e ku mirov bikaribe bi hêsanî xwe jê pak bike. Rûxan, hecinandin û zorlêkeriyên civakî, rûdanên dîrokî ne. Û ew di mêweya sed hezaran sal de pêk tên. Her wiha cebirandin û ewêziya wan jî bi deh hezaran sal didome.

Mirov bala xwe dide navê mêr û jinên kurdan; Ereb, Erebê, Sûrîye, Romî, Tirkê, Siltanê Faris, Cengîz, Fatîh û hwd. e. Ev, xweşibandin û jixwebidûrketinên ji rêzê tenê ne ji bo kurdan; her wîsa ji bo laz, çerkez, gurcî, ermen, asûrî û kêmneteweyên din ên ku nasnameya xwe ji dest dane re jî tiştekî derbasdar e. Ji bilî wê, gelek taybetiyên gelên bindest ên din jî hene. Her gav xwe didin tenîşta hêzên serwer û çewsîner. Şalûsî, şelafî, sîxurî, bêbextî, bêsincî, mêrkujî, sewtelîtî, tolazî û hemû xase û xisletên neçê û nelirê xwe di kesantiya wan de dide der. Tinazker in. Qerf û qeşmeriyê xwe bi gel dikin. Di ser xwe re kesî nabînin. Tu kesî wekî mirov nahesibînin. Devê wan vedibe di eleniya gel de diaxivin. Komel, sazî û dezgehên ku bi kedê hatine avakirin biçûk dibînin. Di çav wan de her tişt bêsûd e. Ji tirkan bêtir tirkperestî, ji ereban bêtir erebperestî, ji farisan bêtir farisperestiyê dikin. Û ji aliyê din ve jî dibin berdevkê mezinandin û pesinandinên wan...

Çarenûsa me hemûyan dişibe ya bav û bapîrê me. Ji bo wê, hêja ye ku ez jî serboriyeke xwe ya balkêş li vir bi xwînerên xwe yên hêja parve bikim.

Ez neh deh salî bûm. Rojekê ji kubara sibehê de diya min ez ji xew hişyar kirim. Mehîneke me ya sor a bi navê Leylê hebû. Ez û diya xwe li mehînê siwar bûn û ketin ser riya çiyê. Wê ez li ber xwe kirim û hevsarê mehînê da destê min. Gava ku mehînê zora min dibir, wê hevsar ji dest min digirt û berê mehînê sererast dikir. Bi rastî min nizanûbû emê bi ku ve herin. Qederê çar saet û nîvan em gihîştin ziyareta Şêx Mehmûd a ku li herêma me(derdora Stewrê û Surgiciyan) pir bi nav û deng bû. Kîjan mirovê/va ku bi qeda û belayekê rû bir û dima û ku ji wê karesatê difilitî, an karekî salê an jî dîkekî gereze li xwe qewl dikir û dibir li ser gorî wî şexsî serjê dikir. Bawer dikim diya min jî bi vê mebestê ez biribûm ser gorî Şêx Mehmûdê Kal. Her wiha li herêmê bi navê Mîrê Ereb şexsekî din hebû. Li vegerê em çûn ser gorî wî jî. Diya min ji mehînê peya bû û sê caran li dora hevşekê gorê geriya. Dawa dariyê xwe vegirt û çend darikên hişk ji guliyê dara guhîjê qurifand û tevî dawa dariyê xwe bi erdê de kuta. Dawa dariyê wê, qulqulî bûbû. Min bi hemû timtêl baldariya xwe ya zarokatiyê jê pirsî : "Dayê tu çima wisa dikî ?" Wê, di ber karê xwe re bersiva min da û got: "Kurê min, Mîrê Ereb şexsekî mezin e. Ehlê Xwedê ye û ne xalî ye. Meriv û maliyên jinikên ku zarok ji wan re namînin tên ber serê wî. Çi cil û bergên wan î minasib ên ku dilê wan de bi qîmet hebe li ber serê şexs xilmet dikin; diqetînin. Xwedê giravî zaroka wan difilite û êdî zorokên li pey wî/wê jî zû bi zû namirin. Îcar Xwedê heft law dan Nahîleya me( Nahîle diya Ereb û biraziya diya min e. Bi pismamê xwe re zewicî bû), belê qedera Xwedê, yek jê jî sax nema. Nahîle dîsa li halekî ye. Ez, vî dariyê xwe yê ku di dilê min de pir şêrîn e hîbeyî zaroka wê dikim. Û hawara xwe dikim Mîrê Ereb. Heke zarok lawik be emê navê wî deynin Munîr an jî Ereb. Herdu nav jî navê Kaliko ne..."

Ez dixwazim gotina **W. Scott dawiyê li** nivîsara xwe bînim.

"Mirov, encama azweriyên xwe yên har û din, dixin stûyê çarenûsa xwe."

*Kaniya Helbestan*

# Natirsîn



**Eta Derwîşî**

Natirsîn ji we, ji top û tangên we
Ji gef û êrîş, ji wan xeyalên we
Tu dibarînî wan bumbe û napalan
Tu şehîd dikî van xort û kalan
Tu wêran dikî gund û bajaran

Armanc, qirkirina gelê min e
Wî gelî ji we zefer çi nine
Pêşmergan ji çiya çeper girtine
Di dilê me de hêlûn çêkirine

Jiyan çênabe bi bombe û napalan
Dastan xilas nabin ji bajar û waran
Gerek birûnên hûn bibin însan
Zalimên wek we neman li tu deran
Qesr û qobên we dê bibin dibistan
Em dê ava bikin welatê Kurdan
Lê ne ji bo kuştin, tenê bo jiyan

We ji me stand serwet û saman
We da top û bombe barandine ser Kurdan
Me jî bersiv da, bi îmana pêşmergan

Îro dujminên me gelek hezar man
Lê em serbilind, ew jî şermezar man

***

www.arsivakurdi.org

agiri

**Duheftînameyek siyasî, civakî, çandî û hunerî ye ku Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê diweşîne**

**http://www.kurdistanmedia.com/kurmanci/index.php**
**Navenda bingehîn ya xebata Agirî li Kurdistanê ye.**
**Navnîşana derveyî welat:**
AFK B.P. 102- 75623 Paris CEDEX 13 –FRANCE

**E - Mail: agiri2003@hotmail.com**
**agiri2003@gmail.com, rojnamaagiri@gmail.com**



# Amed wê bi 7 zimanan were danasîn



Şaredariya Surê ji bo naskirina bajarê Amed, boroşûrên bi zimanê Kurdî, Ermenî, Suryanî, Îbranî jî bi 7 zimanan weşand.

Weke tê zanîn şaredariya Surê, hemû cihên dîrokî û torîstî yên Amedê digire nava xwe, ji bo danasîna bajar, bi 7 zimanan boroşûr hatin amadekirin.

Di xizmetên şaredariyê de ji bo danasîna bajarokên torîstî li gel zimanê Tirkî bi zimanê Îngilîzî û Elmanî jî hatiye bicih kirin.

Cîgirê Şaredarê Surê, Bedrî Turan, da zanîn ku cihên dîrokî ku bi navên Latînî hatine bi navkirin, jibo danasîna bajar û navçeyê, boroşûrên bi 7 zimanan hatine amade kirin.

# Wê carê geştyarên Mirîxê Venagerin




Saziya Nîştimaniya Giştî a Esmaniya Amerîka "NASA", ragihand ku ji bo gera bêmetirsî bo geristêrka Mirîxê, pêwîstî bi karmendan heye, lê ew karmend êdî nikarin vegerin ser erdê.

Ligor çavkaniyên nûçeyan, ew gera bo ser Mirîxê bi mebestên xizmet bi mirovahiyê ye, lê tenê mercê wê geşta esmanî eve ku ew karmend nevegerin ser erdê, çimku ji bo vegerana wan pereyek zaf dixwaze.

Bo akinciyên Mirîxê, xwarin û vexwarin ji erdê ve tê şandin. Eva yekemîn gave bo ceribandina Geristêrka Mirîxê, da ku bizanin dê bo jiyanê bibe yan ne. Ligor nûçeyan, ew geşta esmanî heya 4 mehên din dihê amadekirin û şandin. Bi wî awayî, Mirîx heya sala 2030' an dê bihê avakirin.

# Zirarên Elkulê Ji Y;n Kirakê Zêdetir In



Lêkolînên nû yên rawêjkarên berê ên karûbarên dermanî yên dewleta Berîtaniya, nîşan didin metirsî û têçûna vexwarinên elkolî bo ser ciavkê ji Kirak û Hiroyînê zêdetir e.

Rapora han ji aliyê Komîtetya Serbixwe ya Zanistî li warê dermanan hatiye amadekirin.

Ev Komîte bi armanca lêkolînkirin li ser dermanan bê destavêtinên siyasî, pêk hatiye. Li gor rapora BBC, Deywîd Nat, zanayek ku bi egera diyarîkirina nêrînên xwe yên azad û bêalîgirane derbarê siyasetên dermanî, pileya rawêjkariya dermaniya dewletî jê hatibû standin, serperestiya darêtina raporta han girtibû stûyê xwe. Bo darêtina vê raporê, lêkolîn li ser bandora bikaranîna dermanan li ser 16 cur zirarên ku dixwe ser civakê, wek zirûfa saxlemiya civakê, tawan û cînayet û mesrefên aborî hatiye kirin.

Gorî lêkolînên han zirara bikaranîna Elkulê, 3 hemberî zirara bikaranîna kukayîn yan cixarê ye. Deywîd Nat dibêje: "Herçend mirov pir zû bengdarê kirakê dibe, lê ji ber ku hejmarek zêde ji xelkê civakê elkulê bikar tînin, bi giştî zirarên wê pitir in."

# Devê herî mezin di cîhanê de



Francisco Domingo Bi devê xwe yê mezin kete pirtûka rekordmena Guines ê.

Domîngo, xortekî 20 salî ye, ku ji Angola ye. Ev xortê han ji bona devê xwe yê mezin tomar bike serî li pirtûka rekordmena Guines ê da û nave wî ji aliyê nûnerên pirtûka Guinesê ve hate tomar kirin, ku devê Francisco Domingo devê herî mezin ê cîhanê ye.

Domîno dibêje "Xeyalê min ê herî mezin pêk hat û ez pirr kêfxweş im."

# Ji "Hollywoodê" teklîfa fîlmekê ji Sultan re hat kirin




Xortê Kurd ji Dêrîkê bi navê Sultan Kose, ku dirêjtirîn kes e li cîhanê, berê xwe dide Hollywoodê...

Ewê di fîlmekê de bilîze, lê belê heta niha ne navê fîlmê, ne jî navê derhêner eşkere nebûye.

Sultan Kose ku dirêjiya wî 2.45 cme, bi menejerê şîrketa ku fîlmê çêdike re hevdîtin pêk anî.

Sultan hîn nezewiciye, ew ji Mêrdînê ji xwe re li jinekê digere.

**Avestakurd**

www.arsivakurd.org